 

Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl) | wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 9**

# Hin Pirs Derbarê Êrişa Erebî li ser Kurdistanê

Derbarê êrişên Erebî-Îslamî gelek pirsên vekirî hene ku divêt bêne ronahîkirin. Em sê pirsên girîng dibînin ku bi kurtahî be jî, em hinekê wan avêne û zelal bikin.

## Yekem: Çima Ereban ev welat zû vegirt?

Berî Îslametiyê herêma Rojavayê Asiyayê di navbera emperatoriyên *Sasanî* û *Bizantî* da beşkirî bû. Dijberiya di navbera wan da pir deman berdewam kir. Di sala 602-an da serokleşkerê *Bizantî Fokas (Phocas)* bi dek û dubare emperatorê *Bîzantî Morîs (Maurice)* kuşt û serdariya emperatoriyê bi dest xwe va anî. Daku tukes ji dûnda û malbata *Morîs* venegere ser textê emperatoriyê, wî hemû kurên *Morîs* kuştin, ji bilî yekî ku dikarîbû xwe xilas bike û xwe bigihîne *Kisrayê Sasanî Perwîz* û arîkariyê ji wî bixwaze. Ji ber vê bûyerê di sala 608-an da *Kisrayê Sasanî Perwîz* êriş bir ser emperatoriya *Bîzantî*. Di destpêkê da Sûriya bi dest xwe va anî, bajarên wê kavilkirin, bajarê *Qudus* vegirt, ew darê pîroz ku pêximber *Îsa* li ser hatibû xaçkirin anî ba xwe, di pey ra *Misir* jî vegirt û berê leşkerê xwe da bajarê *Qustantîniyê* (*Paytextê Bîzanta*) ku wî dorpêç bike.

Di sala 610-an da (sala peyadabûna Îslametiyê) serleşkerê *Bîzantî Hêraqliyûs (Heraklius)* ku bi eslê xwe Ermenî bû *Fokas* ji ser textê emperatoriyê avêt, ew da dest gel û ew kuştin. Wisa *Hêrakliyûs* bû emperator, bajarê *Qustantîniyê* ji dorpêçê rizgar kir û êrişa *Sasanî* rawestand. Di pey ra herêma *Asiya Biçûk, Ermîniya* û *Azerbeycan* jî vegerandin bin serdariya xwe. Di sala 624-an da êriş anî ser bajarê *Medayin* (*paytextê Sasaniyan*) li Îraqa niha(1). Tam di wê demê da jî dijberiyên gelek dijwar di hundirê malbata *Sasanî* da gelek tûj bûn ku tenha di hundirê çar salan da deh padîşah (Kisra) hatin ser text û çûn. Yê dawî *Kisra Yezdegerdê Sêhem* bû(2).

Helbet, vê dijberî û keftelefta *Sasanî-Bizantî* herdu emperatorî lawaz û bêhêz kirin. Ji bilî wê, di emperatoriya *Sasanî* da pevçûnên hundirîn peyda bûn, zordarî, bac û salaneyan barê gel giran kirin û bingeha aborî êdî têkçû û pêra tevgerên dijber peyda bûn. di navbera salên 216 - 274-an da pêximber *Manî* xuya bû. Wî doza jiyaneka pasîv dikir ku divêt mirov tenha perestina Xweda

bike, bikaranîna zorê û mehirkirina jinan red bike. Bi demê ra alîgirên wî pir bûn û êdî bi pîrên zerdeştiyê ra kete dijberî û kefteleftê. Bi vî awayî civaka *Sasanî,* ji bandevê ta bingehê, ji hev ket û felişî. Di pey ra *Mezdek* (li gor *Ahora Mezda*) jî li dor sala 487-an peyda bû. Ayîna wî bi armanca pêşxistina *Manîtiyê* bû. Wî doza wê yekê kir ku hemû mal, milk û jin bibin malê civakê, bibin hebûna her kesî; şer û kuştin jî bi temamî qedexe kir. Serdariya *Sasanî*, ji wî û alîgirên wî ra, di sala 523-an da komkujiyek amade kirin(3).

*Manewî* û *Mezdekî* ne tenha du tevgerên ayînî bûn. Ew di bingehê da wek derbirîna dijberiyeka çînayetî bûn di navbera beşekî civakê yê biçûk da ku hemû siyaset, çand û hebûn di dest xwe da girtibû û beşekî mezin yê civakê ku wek koleyan dihate xebitandin. Rewşa civaka *Bîzantî* jî ji vê rewşê ne dûr bû. Di wê civakê da jî, bi encama pirbûna bac û salaneyan li ser milê gel, kavilbûna pir herêmên welat û bi sedema şer û pevçûnan rewşa aborî têkçûbû. Di wê civakê da jî dijberî di navber sê olên *Kirîstiyanî* da peyda bûbû. Li hêlekê ola fermî ya emperatoriyê û li hêla din olên *Nestorî* û *Ye'qobî* (*Monofiziye*) yên dijberî wê. Dijberî û keftlefta van olan di bingeha xwe da wek derbirîna dijberiyeka çînayetî, çandî û neteweyî bûn.

Bi vî awayî, gava Ereban êrişên xwe destpêkirin raserî du dewletan hatin ku di warên siyasî, ayînî, civakî, aborî û neteweyî da gelek lawaz bûbûn. Tenha gava Ereban zora leşkerên *Sasanî* û *Bîzantî* dibirin, navendên bajaran, kelah û parêzgehên wan bi dest xwe va dihanîn, hemû welat diket bin destê wan. Bi vî awayî dikarîbûn welatên *Îraq, Kurdistan, Faris, Sûriya û Misir* di hundirê deh salan da (632- 642) vegirin û têxin bi serdariya xwe.

## Duwem: Çima Ereban Kurdistan talan kir?

Şêx û berdevkên *Îslametiyê* herdem dibêjin ku vekirinên *Îslametiyê* ji bo mirovayetiyê mihirdar bûn. Şêxên *Îslametiyê* yên Kurd angaşt dikin ku bi hatina *Êrişên Erebî* ra li Kurdistanê xêr û bereket li ser Kurdan bariya. Wek ku Kurd berî wê kafir û bêayîn bûn û bi xêra êrişên Erebî Xweda naskirin; wek ku Kurdan bi xwe hin şande hinartin ba *Xelîfeyê Erebî* ku wan ji serdariya *Sasanî* rizgar bike. Yan jî wek ku Ereb hatibin Kurdistanê û bi xwe ra şîranî û kulîlk anîbin û Kurdan jî ew bi lîlî û heyehayan pêşwazî kiribin.

Lê belê rastî ew bû ku Kurd wê hîngê Zerdeştî bûn, berî Ereban bi hazar salî bi Xwedayê Yekane bawer dikirin, û ti pêwîstiya wan tinebû ku kesek Xweda şanî wan bide. Ji *Êrişa Erebî* ra du sedemên bingehîn hebûn:

**Sedemek Diyarkirî**: Ew jî ewe ku mirov ji Yekxwedayiyê bi dûr ketibûn û ji ber ku *Erebên Misilam* leşkerên Xwedê ne, ji erkên wane ku mirovan ji nû va bînin ser *Rêya Xweda*.

**Sedemek Veşarti**: Kurtahiya wê ewe ku êriş û talan beşek ji bîreweriya Erebî bû hên berî dema Îslametiyê. Ji ber rewşa wan ya suriştî, li ba çîna serdest ya bajarê *Mekeh*, bi sedema derbasbûna *Rêya Pixûrê* di welatê wan ra, daxwaza bazirganiya navdewletî hebû ku di bazirganiya cîhanî da beşdar bibin. Wan ev

daxwaza êriş û talanê ya li ba êlên revend yên Erebî bikaranî ku rêyên bazirganiyê û sûkên navdewletî bi dest xwe va bînin.

Rewşa *Geo-Strategî* wisa ferz kir ku Kurdistan bibe armanca pêşîn ya *Êrişên Erebî*. Piştî ku Ereban zora emperatoriya *Sasanî* li Îraqa niha birin, diviyabû ku Kurdistanê têxin bin destê xwe daku karibin ber bi rojhilat va biçin û bigihînin navenda welatê *Fars*. Li çepera *Bîzantî* jî rewş wisa bû. Piştî ku Ereban zora emperatoriya *Romî* li başûr û navenda Sûriyayê birin, diviyabû ku *Rojavayê Kurdistanê* têxin bin destê xwe daku, bi bakur va, ber bi *Qefqas* û *Anadolê* va biçin. Em ji bîr nekin ku xêr û bêrên welatê Kurdistanê jî ji armancên êrişkarên Ereb bû. Herku hejmara kesên ku diketin bin serdariya Ereban pir dibûn, radeya *Cizye, Xerac*, bac, xûk û salaneyan bilindtir dibû.

## Sêhem: Gelo Kurdistan bi şer yan bi aştî hate vegirtin?

Wisa hatiye belavkirin ku Ereban piraniya herêmên Kurdustanê ne bi şer lê bi awayekî aştiyane vegirtine. Armanc ji vê yekê ewe, bidin bawerkirin ku Kurdan bi dilxwazî Îslamtî pejirandine. Yanê! Ne şer û pevçûn, ne kuştin, ne dîlkirin hebûn û ne jî talankirina mal û hebûnên Kurdan hatiye kirin. Di rastiyê da rewş wisa bû ku Ereban bi awayekî tund bajar dorpêç dikirin û gava parêzvaniya bajaran - *Sasanî* dibe yan *Bîzantî* dibe - nikarîbû êdî li ber xwe bide, gel didît ku şer li dijî Ereban êdî şerê têkçûnê ye û eger Ereb bi darê zorê bajêr vegirin, ewê hemû mêran bikujin, jin û zarokan dîl bikin û hemû mal û hebûnên wan talan bikin. Daku ev bobelatên dijwar pêkneyên, çareyeka aştiyane hildibijartin û wisa diketin bin serdariya *Dewleta Erebî*.

Pir belgeyên dîrokî hene ku spartina bajaran, bi awayekî aştiyane, ne ji bo hezkirina gel ji Ereban û Îslametiyê ra bû, lê belê ji bo rizgarkirin ji kuştin, dîlkirin û talankirinê bû. Dîrokzan Al Belazurî dibêje ku Ereban bi rêveberiya *Haşim Bin Utbeh* bajarê *Mehrûz* li başurê Kurdistanê dorpêç kir. Serdarê bajêr 16 *Mikyal* pere dan Ereban daku tikesî ji wan nekujin û gava çûn *Bendenîcînê* (*Mendelî*) gelê bajêr *Cizye û Xerac* dan daku ew neyên kuştin(4). Piştî ku *Abo Mûsa Al Aş'erî* bajarê *Nehawend* yê kurdan vegirt, bajarê *Dînewer* pênc rojan dorpêç kir. Rabû gelê bajêr biryar da ku *Cizye û Xeracê* bidin û xwastin ku ew û mal û zarokên wan bên parastin(5).

Mijareka din jî di vegirtina herêman da bi awayê şer heye. *Al Belazurî* di pirtûka xwe da „*Futuh Albuldan*" ango "*Vekirina Welatan*" cudahiyê dixe navbera vegirtina bajaran û ya gundan (ew dibêje vegirtina erdê). Ew derbarê vegirtina bakurê Kurdistanê dibêje: „Serdarê Ereb *Iyad* bajarên *Reqa, Heran, Ruha, Niseybîn, Meyafarqîn, Qerqîsiya* û gundên ber çemê Ferat û bajarên wê bi awayekî aştiyane vegirtin, lê belê hemû gundên din bi darê zorê vegirtin"(6). Ew dîsa dibêje ku *Iyad* bajarên herêma Cizîrê bi aştiyane vegirtin, lê belê gundên wê bi darê zorê(7).

Sedema vegirtina bajaran bi awayekî aştiyane ew bû ku Kurdistan di bin serdariya *Sasanî* û *Bîzantî* da bû. Helbet, bajar wek navendên hêzên serdariyê bûn, hemû delametkar, leşker û rêberên olî li wir bûn, û gava nikarîbûn bajêr

biparêzin, wan bi Ereban ra lihevhatinek li dardixistin. Lê belê gelê ku li gundan dijî berxwedan li dijî êrişkaran dikir û tenha ji neçarî xwe disparte wan.

Di encama dawî da em dikarin bêjin ku ti sûd û kelka Kurdan di şerê navbera Ereban û emperatoriyên *Sasanî* û *Bîzantî* da tinebû. Serdariyeka kurdî jî tinebû ku Kurdan bi rêxistin bike ku bikaribin li hember *Êrişa Erebî* rawestin; yan jî biryara şer û aştiyê bidin. Ji lewra, gava serdariya *Sasanî* yan jî *Bîzantî* li herêmê têkdiçû, ew herêma Kurdistanê dibû nêçîreka bêhêz li ber êrişkarên Ereb. Kurd, bêyî rêveberiyeka navendî, li hember cîhadîstên ku hem serê wan û hem jî laşê wan bi hemû nawelên êrişkariyê dagirtî bû, bi tenha serê xwe diman.

## Jêder

[1] Ahmad Adil Kamal: Rêya ku diçe Medayin, rûpel 126.
[2] Mahmod Shit Khatab: Rêberên Vekirina Welatê Faris, rûpel 51 - 61.
[3] Faris Osman: Zeradeşt û Ayîna Zerdeştiyê, rûpel 21 - 22. Husain Qasim Al-Eziz: Al Babkiye, rûpel 144 - 145. Komek lêkolîneran: Kerkuk, rûpel 152. Dr. Abdul Azim Remedan: Dijberiya Ereb û Ewropa, rûpel 46.
[4] Al Belazuri: Vegirtina Welatan, rûpel 260.
[5] Al Belazuri: Vegirtina Welatan, rûpel 300.
[6] Al Belazuri: Vegirtina Welatan, rûpel 179
[7] Jêdera berê.